Mirov bi çi tê girêdan!?

Reşoyê Pîrê

Di hemî olên banî , bîr û baweriyên zanyaran de, tiştê herî buha û girîng mirov e. Lewre jî, Kurd dibêjin : **Meriv bi zimanê xwe tê girêdan**) . Yanê gotinên ji devê mirov têne der, ew peyman û biryer in. Ev pirs di jiyana gundiyan de, pir û pir cî girtiye. Lê, di jiyana siyasetê de, ne ewqas normal e

Piştî bûyerên 12ê Avdara 2004 na de, serok komarê Sûriyê, birêz El-esed, di hevpeyvina xwe bi qenala El-cezîrê re, ya di 1ê Gulana 2004 an de, hatibû weşandin û li roja dî,hemî rojnamên Sûriyê yên fermî dabûn belavkirin. Bersiva xwe li ser pirsa Kurd û pûyerên 12 ê Avdarê, weha anî zimên : (***Netewa Kurd li Sûriyê, beşekî bingehîn ji tevna civak û dîroka Sûriyê ye.... Tu destên derve di bûyerên 12 ê Avdarê de tunebûn... Pirsa Kurdên bênasname li ser riya çareserkirinê***

ye.) .Di vê dawiyê de, telvezyona Tirkî, qenala Sikay-Niyoz, hevpeyvinekê bi serok komarê Sûriyê re , li dar dixe. Birêz El-esed, di bersiva xwe ya li ser pirsa Kurd, li Sûryê, weha tîne zimên (***Pirsa Kurd li Sûriyê pirseke Teqenî ye, bi serjimara 1962 an ve girêdayî ye, ew serjimar di warê teqenî de ne li saz bû, tu girêk siyasî nîn in. Ger girêkên syassî ji bo Kurdan hebûna jî, serjimara 1962 an çênedibû. Em jî vê pirsgirêka teqenî çareserdikin. Ji ber tu kelemên siyasî nî nin. Lê, ev pirsgirêka bi dîroka Sûriyê, ji serxwebûnê ve ,hê nehatî û di paşerojê de jî nayê guhartin) .***

Gelo: Di navbera 12ê Avdara 2004 û dawiya 2005 an de, çi hate guhartin daku serok komarê Sûriyê, birêz Beşar El-esed, li xwe vegere û weha bêje !?. **D.R (10)**

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de